

Berlîn, di 9. 1. 1988 de

Birayê Hêja Felek!

Îro min nameya te li gel kerta sersalê wergirt. Her wehaji berî wê jî min hemû nameyên te wergirtin. Ez te li ser rêkirina wan pir sipas dikim. Bi hatina wan ew bîrweriyên xweş û geş careke din tevde dane hildan. Rojgarîyên wisa birastî pir kêmin di jîna Mirovan de. Him sipehîbûna welatê me, bi deşt û newalên wî ve, him jî çiya û sipanên wî ve, her wehaji bi tevaya gul û kulîkên wî ve, pêrejî bi xebata qehremanîyî Pêşmerge ve, van tevan ew rojgarên bihûrî her bi xewnên pir xweş didin xemilandin.

Di nameyên te de zor bi başî liberketim. Her wehaji pêrejî bi wan gelekî dilşad û bextiyar bûm. Di vî warê hanê de ez pir deyndarê te me. Xwezî jî min jî weha bi pîrbûn ji te re bida nivîsandin. Birayê hêja, di vî warê hanê de li min megir, ji ber ev nexweşîya minî qerte. Ez hêvîdarim, ku ji neha û pêve dê ezê